

RAPORA DAWÎ Di pêvajoya Covid-19ê da li deverên cuda yên Stenbolê Lêkolîna zarokan a gihandina mafên xwe

Lênêrîna Zarokan



122 hejmara zarokên beşdarî xebatê bûn û nêrînên xwe parvekirin

DABÊŞÎYA TEMENAN

1.18
3-5 salî

1.55
11-14 salî

1.24
15-18 salî

1.25
6-10 salî

BIDESTXISTINA PERWERDEHÎYÊ

32% zarokan birêkûpêk EBAYê bidest naxin.



16 salî

Me tu tiştê nekir. Mamosteyan gotin ku hûn nekevinê tiştê nabe. Anîn gotina ku bibêjin neyên. Ev li karê mamosteyan tê.

41% zarokan anîn ziman ku nîkaribûn bi mamosteyên xwe ra birêkûpêk têkilî deynin.
9% wan gotin têkilîya bi mamosteyên wan ra wek şandina spartekan bi yek alî ye.

9 salî

Min telefonê girt lê xwişka min telefonê pirtir bikar dihîne, nade min.

Berê, di meha yekem a ku dibistan hat girtin da, ez nîkaribûm bigihêjim. Şifreyê min rast bû lê nedipejirand. Niha dikarim bigihêjim.

16 salî

1.14

Rêjeya zarokên ji ber waneyên di EBAYê da dihên dayîn bilez derbas dibin û wane wan aciz dikin nîkarin bişopînin



20% zarokan dixwazin vegotinên mijaran ên di EBAYê da hîn fêmar bin.



Rêjeya zarokên xwestin mamosteyên wan waneyan vebêjin **16%** ne.



14% zarokan dibêjin dixwazin bi hevalên xwe ra beşdarî perwerdehiya jidûrve bibin.

12 salî

Ku wan jî pirtûkan bişanda dê xweştir bibûya, dikaribûn wek vanan çêkin nişê binivîsîna. Ji xeynî televîzyonê em dikaribûn wiha jî waneyê bixebitin.

Lîstikên li gorî temenê me hebîn, bi hevalên xwe ra jî bikaribim bixavim, bi tenê nebim dê gelekî xweş bibûya.

13 salî

9 salî

Heke yên mezin ji te bipirsîna, te yê ji bo perwerdehiya ji dûr ve çî pêjnîyar bikira? Ka ew qet ji me ra nabêjin ku çawa be; li me guhdar nakin.

BÊHNVEDAN, BIKARANÎNA DEMA VALA, LÎSTINA LÎSTIKAN



19% zarokan anîn ziman ku di vê pêvajoyê da qet bi hevalên xwe ra têkilî danenîne.



1.37
Yên ji xeynî roja xwe ya destûrê jî derketin derve

1.16
Yên di roja xwe ya destûrê da jî derketin derve

14 salî

Ez roja çarşemê derketim kuçeyê. Piştê ez ew şev li mala meta xwe mam. Roja din jî vegeyîyam. Li derve bûn gelekî xweş bûye. Min bêrî kiribû.

14 salî

Welleh êdî derdikevim kuçeyê, carinan gogê dilîzin. Lê ji bo me carinan destûr heye tu dizanî ne wisa? Ez li malê gelekî aciz bûm, hîn zêdetir nîkarim bisekinim. Dêya min jî min xeber dide, lê ez jî destên xwe bi rûyê xwe nakim. Lê em naçin parkê, em wê rojê çûn hanaka vegeyîyan. Ku qerebalix be naçim, lê êdî li malê jî nabe. Raze, rabe, her tim heman tişt

13 salî

Çarşeman nîkarim derkevim, karên dêya min çêdibin. Her wiha bavê min destûr nade. Dibêje hûn ew qas di malê da man, niha jî dernekevin.

BIDESTXISTINA AGAHÎ Û MEDYAYÊ

82% zarokan gotin agahiyên di derbarê Covid-19ê da ji televîzyon û medyaya civakî bidest dixin. **9%** wan jî anîn ziman ku di derbarê pêvajoyê da agahî nagirin yan jî naxwazin agahiyên bigirin.


11 salî

Ez nûçeyan naşopînim, dêya min got tu lê nenêre.

Rêjeya zarokên di hevpeyvîna yekem da gotin bidestxistina wan a internetê tune ye **21%** bû di hevpeyvîna duyem da hat dîtin ku ket **6%** an.

11 salî

Ya rastî ez êdî guh nadim koronayê. Di derdora min da jî kes li ser napeyive, mîna ku tune be tev digirim. Gava ku nûçeyeka di derbarê koronayê da dibinim dibêjim of, ez êdî aciz bûm.



21%

6%

Dane di gulana (çaryeka dawî) 2020an da ji hevpeyvîna telefonê ku tevayî bi 122 zarokan ra li navçeyên Stenbolê yên Fatih-Karagümrük, Fatih-Çapa, Fatih-Mevlanakapı, Fatih-Fındıkzade, Ataşehir-Kayışdaxı, Sancaktepe-Sarıgazi û Beyoğlu-Tarlabasıyê pêk anîn, hatin girtin.



Ev weşan, bi Programa AByê ya Etkinîzê, bi piştgirîya kare malî yên Yekîtîya Ewropayê hatiye çekirin. Ji naveroka vê weşanê bi tenê Komeleya Piştewaniya Civaka Tarlabasıyê, Komeleya Dilxwazên Sulukuleyê, Smal Project Istanbul û Weqfa Çand û Hunerê ya Başak berpirsiyar e û bi tu awayî nêrînên Yekîtîya Ewropayê nişan nade.